HAIKU

Berken Bereh

Xwe nexapîne qulingo
Esman ji nikulan,
Na bive!
*
Li pişt çeperên şevê
Çal û kortîk..
Hemeta xwe bike..

*
Li ser eynî çiqlê darê
Du qumrî
Bêriya hev dikin
*
Min û axê jî vekir
Hemû pencereyên xwe

Ya bi xêr!

*

Ji vir jî dixuye
Hêlîna leglegê
Virtîvala ye

*

Ho qerecdaxo!
Xwedêkî aciz nabî
Tena serê xwe

*

Li kolanê
Bareş û kaxez û poşêt
piyasê dikin

BAR
Ewr çiqas veşêre jî
Di ro de tê dîtin
Rûyê heyvê
Niha nayê dîtin
Wek barê sala
Li ser milê mine.

*

Bêrîkirina te ne ji dil bû
Silavên te
Pûç derket